Kaxiz helwesta

# Mirovên kêmendam di pêvajoya penaberiyê de

Mûmkinkirina gihîştin bê asteng û beşdarbûnê serbixwe ji rewşa niştecihbûnê



## NOW! Ne bêyî Me

### Di derbarê me de

„NOW! Ne bêyî Me“ piştgirêdana bi xwe ya penaberên kêmendam e. Em bi xwe penaber in û kêmendamiya me heye. Ji dema hatina me ya Almanyayê ve em rastî astengiyan tên. Lê em di koma xwe de têgihiştin û hevgirtinê dibînin. Em hevûdu xurt dikin û bi hev re ji bo civakek berfireh dixebitin.

Em tiştekî dikin ku penaberên kêmendam û malbatên wan li Almanyayê bikaribin baştir bijîn.

**Penaxwaz û kesên kêmendam ên xwdiyê Duldungê di pêvajoya penaberiyê de bi gelek kêmasiyan re rû bi rû dimînin: Gihîştina wan a lênihêrîna tenduristiyê sînordar e, xaniyan bi gelemperî ne li gorî kêmendaman in û gelek astengên wan hene. Xizmetên li gorî Qanûna Alîkariyên Penaberan têra gelek hewcedariyên taybet bi kêmendaman nakin. Di heman demê de gelek kesên kêmendam zehmetiyan dikişînin ku beşdarî kursên ziman an jî kursên en-tegrasyonê bibin, ku pir caran ne bê asteng in.**

**Jiyana penaxwazan û kesên kêmendam ên xwdiyê Duldungê di gelek waran de di bin asten-gên wusa de ye ku barekî giran dixe ser jiyan û perspektîfên pêşerojê yên kesên mexdûr.**

## Pirsgirêk

Qanûna Alîkariyên Penaberan (AsylbLG) wergirtina alîkariyên tenduristî, civakî û beşdariyê ji bo penaxwazan û kesên xwdiyê Duldungê bi tundî sînordar dike. Ev bi taybetî zehmet e de-ma ku mijar li ser lênêrîna tenduristiyê be. Kesên ku li gorî AsylbLG xizmetê werdigirin, pir caran berî ku karibin bijîjkek bibînin, hewceya wan bi belgeya ku dermankirina bijîşkî jê re tê gotin, heye. Serdanên doktor bi rêya belgeya dermankirina bijîşkî pir tevlihev e. Gelek caran divê mirov berê xwe bide Daîreya alîkariya civakî û serdanên xwe ji aliyê personelên nebijîjkî ve bide pejirandin.

Pirsgirêkên mezin di dema wergirtina alîkariyên bilez de ji bo kesên kêmendam, yên wekî kursiyên bi teker, gopalên koran û amûrên bihîstinê de derdikevin holê. Daîreyên alîkariyên civakî gelek caran red dikin ku lêçûnan biden. Her çiqas bi rêya §6 AsylbLG mafekî qanûnî yê teorîk hebe jî, di pratîkê de daxwazên têkildar cidî nayên girtin û têne redkirin. Ji ber vê yekê gelek kesên kêmendam alîkariyên ku ji bo jiyana wan ya rojane bi lezgînî hewce ne, nastînin.

Gelek cih an xaniyên penaberiyê ne bê asteng in û ji bo kesên kêmendam ne minasîb in. Serbixwe ji kêmasiyên têkildar, wek nimûne pêdivî bi odeyên ji bo vekişîna ewle, hawîrdorek paqij, azadiya tevgerê û gihîştina bê asteng û hawîrdorek hestiyar heye. Gelek cihên penaberan ên li Almanyayê ji aliyê hejmareke zêde ya mirovan ve tên dagirtin û ji ber vê yekê jî ne li gorî hewcedariyê ne. Ew pir caran bêhijyenîk in. Di pir rewşan de gihîştina bê asteng nehatiye tamînkirin. Rampe, tuwalêtên bê asteng ên wan tune û / an deriyên wan yên agirê hene ku mirovên astengdar nikarin bê alîkarî vekin. Odeyên vekişîna taybet bi gelemperî tune ne. Ji ber ferzkirina xaniyan a ku di §48 a Qanûna Penaberiyê de hatiye destnîşankirin, penaxwaz û kesên xwdiyê Duldungê dîsa jî neçar dimînin ku di van tesîsên mezin de bijîn. Di piraniya rewşan de, destûr nayê dayîn ku ew bixwe li cihek minasîb bigerin.

Her weha wergirtina alîkariya lênêrînê û entegrasyonê li gorî Qanûna Civakî-SGB IX ji bo penaxwazan bi tundî tê sînorkirin. Mirovên kêmendam pêwîstiya wan bi xizmetên SGB IX heye ji bo ku her nebe bikaribin îmkanên beşdarbûnê werbigrin. Bêyî xizmetên têkildar, kesên kêmendam nikarin pêdiviyên xwe yên rojane bi cih bînin. Ev di heman demê de ji bo gihîştina kursên ziman jî derbas dibe, ku pir caran ne bê asteng in.

Em kesên kêmendam ên ku reviyane, di pêvajoya penaberiyê de jiyanek adil û bê asteng dixwazin. Dema pêvajoya penaberiyê, ku pirî caran di stargehên girseyî yên ku hewce-darîyan pêk nayîne, derbas dibe, niha ji bo kesên kêmendam tengahiyek mezin e. Pêdivî ye ku ev yek were guhertin. Kesên kêmendam ji ku tên bila bên, divê tevî hewcedariyên xwe rêz li wan were girtin.

## Daxwazên me:

- Divê ji kesên kêmendam re derfet bê dayîn ku li gorî §48 Asylg erka xwe ya xanî bi dawî bikin û ji cihên pêşwaziya destpêkê yên ku hewcedariyên wan pêk naynin derkevin. Ji xwe di §49, paragraf 2´yê de rêziknameyek heye ku vê yekê mûmkîn dike, lê di pratîkê de kêm tê bikar anîn. Divê rêzikname ji bo kesên kêmendam bêtir bête konkrêt kirin.
- Gihîştina xizmetên bijîjkî divê bi rengekî bê tevlihevî were dayîn. Divê penaxwazên kêmendam bi tevahî bigihîjin karûbarên sîgorteya tenduristiyê ya qanûnî.
- Divê penaxwazên kêmendam li gorî SGB IX xwedî mafekî qanûnî bin ji bo alîkarîyên beşdarbûnê. Ji bo vê yekê divê §100 Paragraf 2 SGB IX were jêbirin. Li wir dibêje: “ Sûdgir li gorî §1 ya Qanûna Alîkariya Penaberan tu alîkariyên xizmeta entegrasyonê wernagirin.”
- Gihîştina kursên entegrasyonê û ziman divê bê asteng be. Divê ji bo kesên kor dibistanên ziman zêdetir bibin.

**Têkilî:**
Mheddin Saho
mohie2011@gmail.com